Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1093 | 23-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# QÊRÎNA ŞENGALÊ

**Cîger Dilşad**

"Cîpanehên Hurmuz xera kirin, agirê wî vekuştin.
Xwe veşartin yên herî gewre ji gewreyan.
Zorkerên ereb her cî kirin wêran.
Heta Şarezor, gundê puleyan.
Siwarên Zerdeşt man bêkes.
Hurmuz, nehat rihmê li hîç kes
"(Ev helbest li ser çerm hatiye nivîsandin û li Şehrîzor (Silêmanî) di sala 669 P. Z. de hatiye nivîsandin)
Ahura Mazda li ser erdnîgariya vê xakê çiyayên mîna kelehan bilind kiribûn. Li lûtkeyên wan çiyayên asê de şkeft û berqefên wan de agirê Hurmuzgehên



pîroz her ronahî dikir dilê evîndar û bawermendên Ahura Mazda.
Ji aliyekî ve bawermendên rêya heqîqetê di Hurmuzgehan de çand, ol, ziman û tova Hurî-Medî diparastin, ji aliyê din ve ji gundên deştê û yên li qiraxên çeman qîr û hawara jin, kal, pîr, keç û zarokan di bin şûrê bin Weqas'ê dagirker re dihatin derbaskirin.
Qêrîn!...
Nalîn!...
Hawar!...
Peyvên qet neyên hezkirin û derûniya mirov serûbino dikin!
Û qirkirina gelekî heftê û sê caran hatiye dubarekirin li ser maka me.
Qêrîn, nalîn û hawara wan her olan da. Di ber olana qêrîn, hawar û nalîna wan bûkên ser bi xêlî, keçên dest bi hine, zarokên pêxwas, dayîkên ku nizanin ka keçên wan bi ku ve birine û kalên bêçare yên ku pel pel li şerma bêdengbûna mirovahîyê dinêrîn, Cîger Efrînî li ser perda dilê xwe di nav çar dîwarên sar û giyankuşt de hatiye asê kirin, bi bijangên çavdilî, piştî qirkirina bîn Weqas pêk anîbû bi 1345 salan ev çend rêz xêz kirin.

Ey Ahura Mazda!
Ka tu li ku yî?
Heftê û sê caran te em neparastin
De were hawara me
Qet nebe
Vê carê bawermend û evîndarên xwe biparêze!
Va ye
Bi ser Laleşa Nûranî ve
Êzîdxanê û Şengalê ve
Ewrên reş û tarî girtin e
Û disa Şengal dike hawar
Êzîdxan diqîre!
Dîsa dest avêtin xwîşk û dayîkên me
Û ji Laleşa Nûranî xwîn diherike!
Hawar e!

Qêrîne!
nalîn e!...

Dibêjin;
Kurdo, merdino!
Em namûsa we ne
Em rûmet û mîrateya kal û bavan e
Va ye
Qîzaniya mirovatiyê
Qîzaniya kurdîtiya kevnar
Ya bi Zend Avestayê hatiye pêçan
Tê çirandin li ber çavan
Zerdeştê kal dibarîne hêsiran!..
Lê
Dinya bêdeng e
Bê dengê mirovatî, kurdno!
Ma nayê guhên we qêrîniya zarokên me
Hawara jin, pîr û keçan?
Carekê!
Erê, tenê carekê binêrin li çavê kalên perîşan
Û zarokên pêxwas man e li wê çola har Ku
Dayîk û xwîşkên wan li bazaran tên firotin!
Bi çavên dilî binêrin!
Li wan lêvên terikî
Û çavên ku ji tirsê dikutkutin di kortikên xwe de
Û bûne volqan, di nava xwe de diteqin
Ey Allah!
Ka tu li ku yî?
Dîsa navê te û pêxemberê te
Bi destên xwe yên qirêj
Li ser paçên reş nivîsîne
Û ola muhammedî dilewîtinin li ser xaka min
Ma nebes e, ey xwedayo,ma nebes e?..

Ji boyî qirkirin sedbare nebin divê em wekî gelê Kurd pirtir li dijî Tecrîdê bi hemû hêza bisekinin û xwe di felsefa Rêber Apo de kûr bikin ;bijîn û bidin jînkirin.
Berîya biqedînim du pirs ji hêzên ku qikirina Şengalê nasîne bipirsim;
1-Hêzên ku rê ji qikirina Xelkê me yê Êzîdî re vekirin,îro wekî ku tu gunaha wan tune ye di perlamento yên xwe de dibêjin; "tişta di 03/08/2014'an de qewimîye QIRKIRIN E" De baş e,ma ne we DAIŞ bi ser Şengalê û Kobanê ve şandin,ma ne we rê ji wan re vekir ku DAIŞ'çî derbasî warê Kurdan bibin. Heger hûn di gotina xwe de rast in,îro bi destê şefê faşist Erdogan qirkirina hemû kurdan tê armanc kırın,çıma bê deng dımîn ın!
2-Hûn çima tecrîdê li ser Rêberê Gelê Kurd dimeşîn in?

# Bi ked û xebat armanca xwe pêk anî

**Baryana Sîdo ku li kampa Serdem a Şehbayê dimîne, li gor şert û mercên koçberî û zehmetiyên herêmê li pey xeyalên xwe yên muzîkjeniyê dibeze.**



Baryana Sîdo ji gundê Çolaqa yê girêdayî navçeya Cindirêsê ya Efrîna dagirkirî ye, niha li Şehbayê koçber e. 16 salî ye. Ji zarokatiya xwe ve li pey xeyalên xwe yên muzîkjeniyê ye da ku rojekê bibe hunermendeke navdar. Lê dewleta Tirk a dagirker bi êrîşên xwe li ser herêma Efrînê bû bend li ber xeyalên Baryanayê. Piştî koçberiya xelkê Efrînê di 18'ê Adara sala 2018'an de Baryana Sîdo li Şehbayê bi cih dibe ta ku bi xelkê xwe re berxwedana xwe dewam bike û bi serbilindî vegere Efrînê.
Baryana Sîdo li ser destpêka gavên xwe yên muzîkjeniyê wiha axivî: ''Ji ber ku di nav malbateke hunermend de dijîm; bav, xwişk û birayê min stranbêj û muzîkjen in, min hez ji huner û muzîkê kir. Lê ji ber ku biçûk bûm û diçûm dibistanê min nekarî zêde bi pêş ve biçim. Lê piştî koçberiya me li Şehbayê, min cihê xwe di koma zarokan de girt û di wir de min stran gotin. Di wir de min hez ji gîtarê kir.''

**'Min zincîrên koçberiyê qetandin'**

Baryanayê bi dewamdarî wiha got: ''Dema min hez ji gîtarê kir, derfeta min a ez hînê lêdana wê bibim nîn bû. Lê ji ber xwişka min muzîkjen û mamosteya kemanê ye û li Şehbayê waneyên kemanê dide, ez hînê lêdana kemanê bûm. Kesê hînê lêdana kemanê bibe, dikare hînê lêdana her amûra bi têl bibe. Min gîtarek ji xwe re peyde kir û bi rêya korsên internêtê xwe hînê lêdana gîtarê kir. Bi israra xwe min zincîrên koçberiyê qetandin û hêdî hêdî zêdetir hînê lêdana keman û gîtarê dibim.''

**'Di çanda Hîlala Zêrîn de endameke sereke me'**

Baryana Sîdo diyar kir ku wê bi rêya perwerdekirina xwe bi xwe û bi alîkariya malbata xwe, di nava Saziya Çanda Jinên Hîlala Zêrîn de ya Kantona Efrîn û Şehbayê de bûye endameke sereke û axaftina xwe bi van gotinan qedand: ''Niha ez li Şehbayê di nava komên Hîlala Zêrîn de li keman, gîtar û defê didim û hêviya min ew e ku xwe hêj zêdetir bi pêş ve bibim û bigihîjim armanca xwe.'' **ANF**

Sudoku: Bersiv 3

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | 7 | 5 | 3 | 6 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 5 | 9 | 6 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 9 | 5 | 2 | 7 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 7 | 4 | 5 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 3 |
| 4 | 8 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 3 | 8 | 4 | 7 | 6 |

Sudoku:Pirs 4

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | | | 2 | 9 | | | |
| 5 | 1 | | | 6 | | | 8 | 9 |
| | 7 | | 8 | | 5 | | | |
| | 3 | | | | 7 | | | |
| | 8 | 7 | | | | 3 | 2 | |
| | | | 6 | | | | 4 | |
| | | | 5 | | 2 | | 6 | |
| 9 | 2 | | | 7 | | | 5 | 8 |
| | | | 9 | 8 | | | | 4 |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Haya wî ji bayê felekê nîne:**
- Li derdora wî çi dibe çi nabe nizane; guhê wî ne li ser derdora wî ye.
**Ho kiriye, ho xwariye:**
- Ne li xema wî ye.
**Ji bejna xwe hîn nebû kiras û xiftanan, lê nayên hemû dewr û zemanan:**
- Dema firset dikeve destê hina lê xemsariyê dikin, sûdê jê nagirin hingê tê gotin.
**Ji Mêmê we ye sala par e:**
-Ew dem derbas bûye; tişt weke xwe namînin; tişta te dîtî niha ne wisa ye.
**Ji serê xwe avêt:**
Guh nedayê; xemsarî kir; girîng nedît.
**Jistûxwekirin e/ji stûyê xwe kiriye:**
- Dema yek karekî, baş nake, seresere dike hingê jê re tê gotin.
**Ji tirekan re hîveron e/nîveron e:**
- Xema tiştekî naxwe.
**Ketiye guhê ga:**
- Bi heman wateyê.
**Ketiye xewa mirinê:**
- Haya wî ji tiştekî nîne; ketiye guhê ga.
**Kêçek dev li guhê wî nake:**
- Bêxem e; xemsar e.
**Kêçek jî dev li guhê wî nake:**
- Xema tiştekî naxwe; mereqa tiştekî nake.
**Li tira xwe xwedî dernakeve:**
- Çawa ku ne wî sûc kiribe.
**Momê agir berda gomê xwe da serê zomê:**
- Hem zerereke mezin da malbata xwe, hem ne li xema wî bû jî.


**Moriya xewê di guhê wî de ye:**
- Haya wî ji dinyayê nîne; li derdorên wî çi dibe çi nabe nabihîze.
**Moriya xewê ketiye guhê wî:**
- Bi heman wateyê.
**Mêran mêr dikuştin Cibo ûr dişûştin:**
Bi heman wateyê.
**Mêran mêr dikuştin Fatekorê hûrpizûr dişûştin:**
-Bi heman wateyê.
**Nanê şkeva ye:**
- Bêked e; baş li ser tiştan nasekine; seresere dike; guhê xwe baş nade tiştan.
**Ne li min e ne li te ye/ne bi min e ne bi te ye:**
- Ne li xema wî ye; xema tişekî naxwe; tiştek jê re ne derd e.
**Paş guhê xwe ve avêt:**
-Bi heman wateyê.
**Paşguh kir:**
- Bi heman wateyê.
**Pêşiya malê xişt û pişt, pişta malê rîx lê hişt:**
Kesên karê xwe seresere dikin ji bo wan tê gotin.
**Qet nayne ser barê xwe/qet nayne ser xwe:**
Çawa ku ew jî ne berpirs be; çawa ku ne karê wî be jî
**Qet qusa xwe lê nake:**
- Çawa ku ne wî kiribe; çawa ku ne behsa wî bikin.
**Qet xwînê ji xwe bernade:**
- Çawa ku ne wî kiribe; çawa ku ne sûcdar be; çawa ku ne ji wî re hatibe gotin.



# Navdarê nemir Nûrî Dêrsimî

R-7

# Li Kurdistanê qirkirina xwezayê



Hevseroka Desteya Ekolojî ya herêma Firatê Emîne Wêso polîtîkayên qirkirina xwezaya Kurdistanê nirxand û ji bo parastina jîngehê banga hişyariyê kir.R-2

# Banga yekrêziya kurdî



Rewşenbîr, nivîskar û seyasetmedarên Rojavayê Kurdistanê banga Yekrêziya Kurdî kirin û gotin, ji bo bidestxistina mafê gelê Kurd û têkbirina dagirkeriya li ser Kurdistanê yekrêziya gelê Kurd pêwîste.R-4

Girtîgeh bûne cihê şikandina vîna jin
Nehîr Pale R-2

Dîsa PDK...
Farûq Sakik R-5

Li Sûriyê sebra gel bi dawî dibe
Ahmed Aktaş R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1093 | 23-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# BÊDENGIYA CÎHANÊ HEVKARIYA SÛCÊN DAGIRKERIYÊ YE

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi hezaran sûcên giran li dijî gelê Efrînê kirine, bi taybet jin û zarok dibin armanc, Efrîna ku bi navê bajarê aşîtiyê û demokrasiyê dihat nasîn, îro ji aliyê dagirkeriyê ve veguheriye navenda sûcên dijmirovî. Endama Meclisa PYD'ê Îlham Mihemed diyar kir ku ji ber bêdengiya navnetewî sûcên dagirkeriyê li Efrîn zêdetir dibin û tevahiya nirxên mirovahiyê tê binpêkirin.R-5



# Ciwan berê xwe didin qadên berxwedanê



Tevlîbûna nava refên gerîlayên azadiyê dewam dike, di vê çarçoveyê de 20 ciwanan bi daxuyaniyekê ragihandin ku ew tevlî nava refên gerîla bûne û gotin;"Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, ji bo hilanîna tola şehîdan, ji bo avakirina jiyaneke azad ji mezlûman re em tevlî nava refên gerîla dibin."R-3

# 'Civaka komînal, civaka azad e'

Hevserokê Kumîteya şaredariya Qamişlo Silêman Xelîl diyar kir ku di civînên gel de rewşa xizmetguzarî û pirsgirêkên heyî hatin gotûbêjkirin û li daxwaz û rexenyên gel jî hate guhdarkirin. Herweha ji bona avakirina civakeke komînal û azad ancax bi kar û xebateke hevbeş derkeve holê.R-7



# Li Kurdistanê qirkirina xwezayê

Hevseroka Desteya Ekolojî ya herêma Firatê Emîne Wêso polîtîkayên qirkirina xwezaya Kurdistanê nirxand û ji bo parastina jîngehê banga hişyariyê kir.

Polîtîkayên dewleta tirk a li ser qirkirina xwezaya Kurdistanê her ku diçe zêde dibin ji ber vê yekê jiyana zindiyan xerab dibe û xebatên çandinî û lawirvaniyê nayên kirin. Hevseroka Desteya Ekelojîk Emîne Wêso derbarê polîtîkayên qirkirina xwezaya Kurdistanê de nirxandin kir.

Emîne Wêso destnîşan kir ku polîtîkayên qirkirina xwezayê ya li ser Kurdistanê girêdayî polîtîkayên qirkirinê ye û li dijî vê yekê got: "Armanca me ew e ku em daran li herêmê zêde bikin da ku welatekî xweş were avakirin. Gelek sûd ji xwezayê tê girtin, hewaya baqij û bi oksîjen zêde dibe û di aliyê zanistî de jî axê digre û nahêle were xerabkirin. Ji bo lawiran her ku hejmara daran zêde dibe cureyên lawiran jî zêde dibin lê ji bo mirovan ji aliyê derûnî ve jî gelek bi sûd e. Armanca me zêdekirina daran û avakirina daristanan li herêmê ye weke ku tê zanîn Kurdistan bi xweza û darên xwe bi bereket e û bi çiyayên xwe tê naskirin."

### Li ser daristanên Kurdistanê talan

Emîne Wêso bal kişan êrişên dewleta Tirk a li ser Kurdistanê, destnîşan kir ku beşekî ji van êrişan jî li ser xweza û bedewiya Kurdistanê tê meşandin. Emîne Wêso wiha domand:"Dewleta tirk êrîşê ser daristanên Kurdistanê dike. Li Çiyayê Cûdî daran dibre û li hêrêmên Şirnex û Colemêrgê dar tên qutkirin û şewitandin. Li ser darên Kurdistanê bazirganî tê kirin û li herêmên din tên firotin



lê heya niha her kes bêdeng e û hovîtiya dewleta tirk berdewam dike. Dema ku dar tên şewitandin, nahêlin ku welatî biçin daristanan agir vemirînin. Ji bilî vê êrîşên xwe li ser gelê Kurd li ser xwezayê jî zêde dike. Dema ku herêma Efrînê hat dagirkirin û dûre bi rojana ji aliyê dewleta tirk û çeteyên girêdayî wî ve dar hatin qutkirin û hê jî ev yek didome. Li daristanên Efrînê dar nemane weke çiyayê Meydankê cihekî ku dema mirov bala xwe didayê rehet dibû niha tu li wênayan mêze dikî dibêjî ew ne ew çiya ye, ewqas guhertin tê de hatiya çêkirin."

### Bi polîtîkayên li dijî Kurdistanê ve girêdayî ye

Emîne Wêso got ku dewleta Tirk tevî ku ewqas daxuyanî tên dayîn jî bi zanebûn daran qut dike da ku Kurdan ji cihê wan derxe bi serbestî siyaseta xwe bimeşînê û wan ji holê rake û anî ziman ku armanca



vê yekê gelê Kurd koçberkirin e. Emîne Wêso wiha got: "Ji ber ku em Kurd girêdayî ax û xwezayê ne, berê xwe bidin her deverê dixemilînin, mînaka berbiçav jî xelkê Efrînê ye, dema koçberî Şehbayê bûn û ruxmî êrîşan li derdorê konê xwe dar û gul çandin e. Ev tişt dide xuyakirin ku Kurd ji berê ve bi xwezayê ve girêdayî ne, ji lewra erîşî me û xwezaya me dike da ku gel koçber bibe."

### Banga hişyariyê

Emîne Wêso ya bal kişand li ser pêwistiya xwedî derketina li xweza û jîngehê bi van gotinan banga hişyariyê kir: "Em wek saziyên ekolojîk ên herêman divê bi giştî dengê me ji hovîtiya dewleta tirk re bilindtir be û xwedî sekn be. Ew saziyên ku xweza û mirovahiyê diparêzin bi me re bibin yek da ku li hemberî dewleta tirk derkevin û pêşî lê were girtin." **NÛ JINHA**

## Ji Pênûsa Jin

### Girtîgeh bûne cihê şikandina vîna jin

Nehîr Pale

Leşkerên dixwestin destdirêjî Besê Xanim û Zerîfa Xanim bikin, leşkerên ku Leyla Qasim bi darve kirin, PDK`iyên Gulnaz Karataş (Bêrîtan) dorpêç kirin, mîtên ku Sakîne Cansiz (Sara) û hevalên wê qetil kirin, DAIŞ`iyên jinên Şengalê li bazarên Reqa û Mûsilê firotin, polîsên Jîna Emînî kuştin û çeteyên niha li Efrînê rojane jinê tecawiz dikin heman polîsên ku destdirêjî Gultan Kişanak kirin.

Dagirker yek ji rêbazên ku li hemberî jinên şoreşger û siyasetmedar didin meşandin û dixwazin îradeya wan bişkînin, girtine. Bi taybet dewleta Tirk a dagirker li hemberî şoreşger û siyasetmedarên li gel wê girtîne rêbazên herî qirêj û kirêt dide bi kar anîn. Girtiyan weke dîl dibîne û aliyê fêzîkî, piskolojîk û fikrî ve wan işkence dike.

Sala 1980 bi derbeya 12`ê Îlonê re di girtîgeha Amedê de hemû rêbazên ku rûmeta şoreşgeran bişkîne li hemberî wan da bi kar anîn. Sakîne Cansiz yek ji şoreşgerên ku li hemberî polîtîka Tirkiyê ya girtîgehan li ber xwe da. Li dadgehê parastina xwe kir, hêz dida hevalên xwe yên jin ku li ber xwe bidin û lewaz nekevin, dest bi çalakiya girava birçîbûnê kirin û her li hemberî xwe têdikoşiya ji bo zeyîfatî nede leşkerên Tirk û di hemû nêzîkatiyan de xwedî helwest be.

Bi sedan jin û mêr ji ber sedemên siyasî li girtîgehên Tirkiyê têne rizandin, hinek ji wan ev bûye 30 sal di girtîgehê de ne. Hejmarek ji girtiyan jî nexweşin û wan serbest bernadin heyanî ku bimrin û cenazeyên wan ji malbatên wan re rêbikin. Niha jî li gorî parlementerên Partiya Çep a Kesk daxuyanî dan li girtîgehên Tirkiyê 300 girtî hukmê wan bi dawî bûye lê di bin navê cezaya disiplînê de wan serbest bernadin.

Gultan Kişanak girtiyeke siyasî ye û ev bûye 7 sal bê ku were darizandin di girtîgehê de ye. Roja 9`ê Tebaxê cendermeyên Tirkiyê ew ji girtîgehê birin Xerpêtê ji bo tevlî merasîma definkirina xwişka xwe bibe û di vegerê de cenderme wê dibin girtîgeha Xerpêtê wê dixin depoyekê de û işkence dikin.

Êdî dewleta Tirk a dagirker girtîgehan weke navendên işkence, terbiye kirin, îrade şikandinê, rizandin û kuştine dide bi kar anîn. Li Tirkiyê kî behsa demokrasiyê bike, mafên xwe bixwaze yan hikûmeta AKP-MHP`ê rexne bike wê sûcekî bavêjin ser û têxin girtîgehê de. Niha bi riya girtîgehan êrîşî jin dikin û kîjan jin biryara siyasetê bide dê bibe hedefa hikûmeta AKP û MHP`ê.

Pirsgirêka dewleta Tirk a dagirker bi jinê re îdeolojîke, heyanî ji destê hikûmeta AKP`ê û MHP`ê were ji bo jin nefes negrê wê serê jin biperçiqîn in. Ew dizanin her çiqasî jin pêşbikeve iqtîdara wan dikeve xeteriyê de û wê dawî li desthilatdariya wan were.

Di vegera li dîrokê tê dîtin ku jina li hemberî sîstema desthilatdar, li dijî zîhniyeta mêr têkoşiyaye yan li gorî zagonên jêre hatine dayîn ne meşiyaye wê bi tiştekî sûcdar kirine û dawî li jiyana wê anîne. Di çaxên navîn de dadgehên engîzasyonê bi hezaran jinên ku zanist dixwestin ew bi sehir sûcdar kirin û di girtîgehan de şewitandin. Îro jî zîhniyeta AKP`ê û MHP`ê ya çaxa navîne û her jineke têdikoşê wê di girtîgehan de dukjin û dawî li jiyana wê tînin.

# Azadiya jinê bi têkoşîn û rêxistinkirinê pêkane

**Çalakvanên ku beşdarî konferansa jinan a di 18-19'ê Tebaxê de li paytexta Lubnan Beyrûdê hat lidarxistin bûn teqez kirin ku têkoşîna rêxistinkirî yek ji pîvanên azadiya jinan e.**

Li paytexta Lubnan Beyrûdê bi pêşengiya Komeleya Jîn a Jiyanê û Însiyatîfa Nûn a ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dirûşma "Li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî" di dîroka 18-19'ê Tebaxê de bi sernavê "Ezmûnên Tevgerên Jinan ên Navneteweyî" konferansek hat lidarxistin. Di serî de welatên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîqayê ji 12 welatan 100 jin beşdarî konferansê bûn. Konferans diyarî jinên Êzidî yên di 3'ê Tebaxa 2014'an de ji aliyê DAIŞ'ê ve bi qirkirinê re rûbirû mabûn û jinên Efgan hat kirin. Di konferansê de jinan bi biryara ku ji 7 xalan pêk tê soza mezinkirina têkoşînê dan.

Çalakvanên Tûnisî ên ku beşdarî konferansê bûn, der barê girîngiya têkoşîna rizgariya jinan û sûdgirtina ji ezmûna jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de nêrînên xwe




anîn ziman. Jinan diyar kirin ku divê mekanîzmayên têkoşînê ji bo azadî û jiyanê xurt bikin.

### 'Jinên ji Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîqayê di konferansê de amade bûn'

Koordînatora Însiyatîfa Nûn Sawsan Shoman ku beşdarî konferansê bû got ku Însiyatîfa Nûn li Lubnanê ava bûye, tê de komek jinên ji Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîqayê hene. Sawsan Shoman wiha got: "Di konferansê de li ser girîngiya pêwendiya di navbera hemû dewletan de ji bo însyatîfê berfireh bikin û armancên xwe pêk bînin hat rawestîn." Sawsan Shoman diyar kir ku beşdariya jinan di encama hemû pêvajoyên cuda yên guhertinên siyasî û diyalogên aştiyê de, bi taybetî di çarçoveya têkoşîna femînîst de pêk hatiye, ji Bakurê Afrîqayê bigre heta Rojhilata Navîn jin beşdar bûne.

### 'Pêşketina jinan li Rojhilata Navîn dê bibe mekanîzmaya guhertina civakî'

Xebatkara Akademiya Jinelojiyê Rojiyan Hisên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê beşdarî konferansê bû got: "Pêşketina jinan û rizgariya wan li Rojhilata Navîn dê bibe mekanîzmaya guhertina civakî û bingeha rizgariya hişmendiya ku sîstemên desthilatdar ferz dikin. Tevî ku tevgerên feminist, sosyalîst û şoreşên civakî li seranserê cîhanê derketine jî mijara rizgariya jinan ji bo wan xala dawî bûye. Bi derketina Rêber Abdullah Ocalan û nîqaşkirina mijarên têkildarî jinan û têkiliya wan a bi azadiyê re, rê û rêbazên çareseriya vê pirsgirêka civakî derketin, ev jî di dîroka jinan de berê tune bûye. Bi mirateya bi hezaran salan karên cidî gav bi gav tên kirin ji bo pêşxistina projeya serbixwe û plana stratejîk. Rêber Abdullah Ocalan bi xwe nakokiyên mijara azadiya jinan dît diyar kir ku koka van nakokiyan vedigere malbat, heval, civak û tevgerên çep di salên 1960-1970 de."

Rojiyan Hisên di dawiya axaftina xwe de behsa fikra hevjiyana azad ku bi rêbazeke nû di cildê pêncemîn a Manfîstoya Şaristaniya Demokratîk û Doza Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan destnîşan kiriye kir. Rojiyan Hesen wiha got: "Pêşketina çêbûye, li ser bingeha têkiliyên navbera mêr û jinan de bi wekhevî û serxwebûna di navbera herdu zayendan de ye. Tevî taybetmendiyên herdu zayendan û aliyên wan ên cuda û wekhev girtiye dest û analîzên balkêş kiriye." **JÎNHA**



# Navdarê nemir Nûrî Dêrsimî

Ji destpêka Dîrokê ve gelek navdarên kurd jiyana xwe di kar û xebatê welat de derbaskirin e. Nûrî Dêrsimî jî yek ji wan kesan e, ku ji destpêka jiyana xwe ve, weke welatparêzekî çalak cihê xwe di nava civakê de girtibû.

**Ciwana Mûsa/Qamişlo**

Gelek kesayetên kurd yên mîna şoreşger û têkoşeran ku bi fedakarî xizmeta gele xwe kirine derketine holê, yek ji wan jî ku di dîroka Kurdistanê de, navê xwe nivîsandiye, Nûrî Dêrsimî ye.

### Kurteçîroka jiyan û xebata Nûrî Dêrsimî

Avdara sala 1892`an, li gundê Axzonîkê–parêzgeha Dêrsimê, Nûrî Dêrsimî ji bavê xwe Îbrahîm û diya xwe Zelîxe re çêdibe, li dinê çavan vedike. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Xûzatê û ya navîn li Xarpîtê diqedîne. Paşê, sala1911`an, ew diçe Stenbolê, zanista bijîşkiya ajalan dixwîne. Hê ji ciwaniya xwe ve, bi temenê xwe yê piçûk, tevlî refên kar û xebatê dibe. Sala 1918`an, ew di Komela Bilind a Kurd de, ya ku bi pêşengiya siyasetmedar û zaniyarê Kurd ê gewre Seyid Ebdilqadir Kurê Şêx Ubeydellahê Nehrî bi rê ve diçû, dibe endam, û da ku gelê xwe ji bindestî û koletiya reş rizgar bike, zend û



bendên xwe badide û bi dilsozî xebatê dike, û ji ber çalakiyên xwe, ew tê binçavkirin. Radibe ji Stenbolê derdikeve, diçe welatê bav û kalan, û li Dêrsimê cîwar dibe.

Ew û hevalê xwe Elî Şêr, bi hev re, kar û barê serhildana Qoçgêriyê dikin, ew a ku 6ê Avdara 1921`ê destpê bûye, û bi tundî û hovîtiya dewleta Tirk di nav xwînê de maye. Li wir, ew ji aliyê leşkerên Tirk ve tê girtin, lê bi alîkariya Seyid Riza serbest tê berdan. Girtin û zindankirina wî, hêvî û moralên wî naşikîne, û her ew têkoşîna xwe ya netewî berdewam dike. Dema serhildana Dêrsimê sala 1937'an destpê dike, ew dibe yek ji rêberên wê yên sereke.

Mixabin, dema serhildana Dêrsimê têk diçe, ew neçar dimîne, berê xwe dide binxetê, ji wir diçe Urdinê, û sala 1940`î, li tataxa "Miheta Bexdad", bajarê Helebê cîwar dibe, kar û xebata rewşenbîrî û ramyarî didomîne. Piştî dardakirina Seyid Riza, dewleta Tirk 4 hezar zêrên Osmanî ji wî kesê ku serê Nûrî Dêrsimî jê re bîne dike xelat. Dema dewleta Tirk dibihîze ku ew li Urdinê cîwar bûye, ji hikûmeta wê dixwaze ku ew Nûrî Dêrsimî radest bike, lê Urdin xwesteka wê napejirîne, red dike. Li Sûriyê, û li gor biryarên ku dewletê dana nasnameya Sûrî ji bo hemwelatiyên Iskenderonê dabû, Nûrî Dêrsimî nasnameya Sûrî werdigre û ji welatiyên vê dewletê tê jimartin.

Sala 1952`an, bi sernavê"Dîroka Kurdistanê-Dêrsim", li Helebê, ew pirtûkekê çap û belav dike, têde, tewan û kiryarên hovane yên dewleta Romê ya ku 222 gundên Kurdan wêran kirine û bêtir ji 15000 Kurd, zarok, jin, pîr û kal kuştine belge kirine.

Gelek Kurdên Kurdax, Heleb û Cizîrê li mala wî civînên Kurdewariyê girêdane, li ser destên wî fêrî zimanê Kurdî bûne, ji kaniya zanîn û ezmûna wî ya Kûr sûd wergirtine. Berî ku ew koça dawîn bike, wî sala 1963`an gora xwe û ya hevjîna xwe li rex hev, li goristana "Henan", ya nêzîkî bajarê Efrînê kolane, û ev rista jêrîn li ser kêla xwe nivîsandiye:

"min jî li ser vê rêya dijwar, gelek kire qîr û hawar

da ji bo we jî rojekî, dinya bibe gulbihar"

Roja 22ê Tebaxa 1973`an, li Helebê, dilê vî lehengê Kurd radiweste, çavên xwe dige, û ew li Şêx Seîd, Seyid Riza pêşewa Qazî Mihemed û hemû navdarên Kurdan dibe mêvan.

Hêjayî gotinê ye ku dewleta Tirk a dagirker di dema dagirkirina Efrînê de ku di sala 2018`an de bû, hemû cihên pîroz û kevnar wêran kirin, di nav wan de jî gora Nûrî Dêrsimî û hevjîna wî jî hebû.

# 'Karê destan hunera vejandina filiklora kurdî ye'

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Bi armanca vejandina filklora kurdî, pêşxistina karê destan û çêkirina tabloyan bi kolana li ser textan, di sala 2021'an de pêşengeha karê destan li bajarê Qamişlo hat vekirin.**

Ji ber girêdana gelê kurd bi kevneşopî û Dîroka xwe ve pir kûre. Ji ber vê yekê giringiyê didin çand û hunera xwe. Yek ji van kevneşopiyan karê destan e. Herwiha pêşengeha Ferîd Hiso ya karê destan di sala 2021`an de bi pêşenga 3`ê jin û 2`î Zilaman kar û xebat tê meşandin. Derbarê pêşengeha karê destan de, Şêwekar û Rêveberê pêşengehê Ferîd Hiso û endama pêşengehê Cîhan Ebd Elxefûr ji rojnama me re axfîn.

Ferîd Hiso diyar kir ku du pêşengehên taybet ya karê destane li bajarê Qamişlo bi navê Ferîd Hiso, Ferîd û Wehîd hene û wiha got:"Ev demeke dirêje me dest bi kar û xwebatên destan û vegera alavên dîrokî kiriye. Di sala 2021`an de pêşengeheke me bi navê Ferîd Hiso li bajarê Qamişlo hat vekirin. Herwiha bi demê re kar û xebatên me roj bi roj pêşdiket. Niha jî karê ku li pêşengehê tê kirin evin. Tabloyên Zeyîtî, Şewtandina Serdep, Cam, kertûnê komir û Wêneyên hunerî jî tên çêkirin. Karê ku jin jî pê mijol dibe Morîk, Hermel û karê xemlandinê ye."

### 'Bi riya karê Destan hestên xwe derdixim'

Şêwekar û Rêveberê pêşengehê Ferîd Hiso hestên xwe wiha anîn



ser ziman:"Di zarokatiya min de hezkirina min ji karê destan re hebû. Ji ber vê yekê min xwe fêrî karê destan kir û gelekî ji karê xwe hezdikim.Bi riya karê destan hestên xwe vedibêjim, girêdayî vê yekê di xwendinê de jî min xeyal û daxwazên xwe bi cih anî. Herwiha mamoste û malbata min jî piştgirî ji xwesteka min re kirin. Dema ku ez mezin bûm min ev kar ji xwe re kir bingeh û min karê hunerî û bazirganî bi hevre da meşandin. "

### 'Tabloyên xwe li cîhanê belavbikin'

Ferîd Hiso axftina xwe wiha bi dawî kir: "Armanca me ya sereke ew bû ku çanda karê destan neyê jibîrkirin û berdewamiya wê bimîne. kesên ku daxwaza wan ji vî karî re hebe, karên xwe pêş bixin û werin li karê me binêrin. Heger ji bona kirînê an



jî ji bona fêrbûnê be em amedene bi wan re alîkarbin. Pêşengeha me geleriye li pêşiya her kesî vekiriye. Herwiha Ji bo ku tabloyên xwe li cîhanê belavbikin. Pêwistî bi berdewamiya belavkirin û pêşxistina karê destan heye."

### 'Mijûlbûna bi karê destan êşa jiyanê ji bîr dike'

Endama pêşengehê Cîhan Ebd Elxefûr diyar kir ku ji zarokatî ve dest bi karê destan kiriye û wiha got:"Ji ber hezkirina min ji karê destan re hebû ji temen 10 salî de min dest bi vî karî kir. Ji bo vê yekê, xwendina min ji girêdayî xwebatekirina mamosteya beşa xebatê destan li zanîngeha Şamê bû. Piştî dawîkirina Zanîngehê di warê piratîkî de, min dest bi karê destan kir. Herwiha di karê destan de rehetiyê dibînim, ew karekî gelek balkêş e. Dema ez vî karî dikim kêfxweş dibim û her



tiştên bi êş yên jiyanê ji bîr dikim."

### 'Daxwazên min vejanda Filklora kurdî ye'

Cîhan Ebd Elxefûr axftina xwe wiha qedand:"Ev nêzî 20 salan karê destan dikim. Destpêka ku min dest bi karê destan kir bi xwesteka min bû, niha jî dixwazim filiklora berê vegerînim. Di pêşengeha Ferîd Hiso de, di beşê filklor û xeşebiyat de kar dikim. Herwiha min dest bi karê filklorî jî kiriye, daxwaza min pêşxistina Filkloriye. Ev kar bala mirovan dikişîne, ji bo min kêvxweşiyek e. Li ser Filiklora berê jî ji kesên bi temen mezin dipirsim û tiştên ku dibêjin ez çêdikim. Pêşwaziya civakê gelekî ji karê destan re heye. Dama derbasî pêşengehê dibin ji bedewbûn karê destan matmayî dibin, ji ber cihekî rehetiyê û cuda dibînin. Ji gelek bajaran tên û wêneyên karê me digrin. "

# ‘Civaka komînal, civaka azad e’

Hevserokê Kumîteya şaradariya Qamişlo Silêman Xelîl diyar kir ku di civînên gel de rewşa xizmetguzarî û pirsgirêkên heyî hatin gotûbêjkirin û li daxwaz û rexenyên gel jî hate guhdarkirin. Herweha ji bona avakirina civakeke komînal û azad ancax bi kar û xebateke hevbeş derkeve holê.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo konfiransa xwe di sala 2022’an de li dar xist. Di konfransê de kar û xebatên şaradariyê hatin nirxandin û plansaziya sala nû hat diyarkirin. Di konferansê de, biryar hat dayin ku her 3`ê mehan civîn ji gel re werin lidarxistin. Bi armanca ku daxwazên gel werin bi cih anîn û rexnên gel ên ji bo şaradariyê li ser were seknandin ji milê rêveberiyên şaredariyê ve civîn ji gel re hatin çêkirin..

Di vê çarçoveyê de hevserokê qumîteya şaradariya Qamişlo Silêman Xelîl ji rojnameya me re axivî.



### ‘Civînên gel cihê çareserkirina pisgirêkan e’

Silêman Xelîl da zanîn ku di sala 2022’an de konfiransa ku hat li darxistin û di konfiransê de biryar hate girtin ku civînên gel ku her 3`ê mehan carekê were lidarxistin û sîstema kar û xebatê ji nûve di ber çavan re hate derbaskirin. Di konfiransê de biryarên nû hatin girtin û sîstemek nû hat avakirin. Herwiha yek ji van biryaran ew e, ku her 3 mehan civîn ji gel re were lidarxistin, da ku rexne, daxwazên xwe û astengiyên ku dikşînin werin vegotin û li ser were seknandin.

Silêman diyar kir ku her 3 mehan rapor li ser kar û xebatên şaredariyê yên 3`ê mehan tê nivîsandin û radestî komînên taxan têne kirin û têne xwendin. Li ser vî esasî rexne, û daxwazên gel hebin di van civînan de têne kirin. Ev jî ji bo me çavkaniya hêz û pêşketinê ye. Ji ber ku dema rexne li cihekê pêşbikeve wê demê wê guhertin pêkwere. Silêman destnîşan kir ku ew wekî şaredarî nêrîn û rexneyên gel girîng dibînin û got: Bi rastî hin rexneyên gel hene, lê heyanî neha li ser nehatiye seknandin û pirsgirêkên heyî nehatine çareserkirin. Dibe ku sedema wê jî girêdayî kêm derfetên abûrî be lê em û rêveberiya xweser hewl didin ku daxwazên gel pêk bînin.

### ‘Şaradarî her tim di nava kar û xebatê de ye’

Xelîl wiha berdewamî da axaftina xwe û got:”Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo projeyên xizmetguzariyê pêşxistiye. Yek ji stûnên bingehîn ên sîstema rêveberiya xweseriya demokratîk ku niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin, şaredariyên gel in, ku ji hemû bajar, navçe û gundan re xizmetê dikin. Li gelek herêmên cuda bi dehan şaredarî hatin vekirin û ev şaredarî di nava kar û xebatê de ne. Bi sererastkirina rêyan û domandina tora paqijkirina taxan û gelek karûbarên din ên xizmetguzariyê.”

### ‘Xebatên xizmetguzariyê li gund û bajaran bê navber didome’

Silêman da xuyakirin ku şaredariya gel a bajarê Qamişlo, ku bi şaredariyên navendî û xalên xizmetguzariyê yên xwe re hewil dide ku rastiya xizmetguzariyê di nava bajar û gundên wê de pêş bixe. Bi rêya projeyên ku li gorî karîn û pisporiya ku li ber destê wê plan dike û her sal qada karê xwe berfirehtir dike, ku ji sala borî baştir bibe.

Silêman wiha axavtina xwe domand û got: “Li cihê ku şaredarî bername û plansaziya projeyên ku dê di nava salekê de biqedîne. Di nav wan de (ziftkirina rêyan, danîna kevirên hûrkirî, paqijî, ronîkirina bajar û baxçeyan, domandina tora avê yên xerabûyî, amedekirina avahîyan. Ketin û derketina bajêr) û ev yek ji aliyê şaredariyê ve hatiye plankirin ku ji karê wê yê xizmetguzariyê beriya hatina zivistanê bi dawî bibe.”

Silêman wiha dawî da axaftina xwe û destnîşan kir ku: “Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo xebatên girêdayî projeyên xwe yên ku ji bo havîna îsal hatine plankirin didomîne, ji aliyekî din ve welatiyan xebatên şaredariyê bilind nirxand û banga hevkariyê kirin. Di mijara lênêrîna paqijiya giştî de û avakirina civakeke komînal û azad bi ked û destê gel.

# Xwendekarên Peymangeha Tenduristî li Şehbayê pirojeyên derçûnê amade dikin

**Zana Roj/ Şehba**

**Tevî dorpêç û êrîşên domdar yên ser herêma Şehbayê, Xwendekarên Peymangeha Tenduristî piştî kedeke mezin, pirojeyên derçûna dewreya yekemîn amade dikin.**

Piştî derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re, sîstema xwendinê di gavên yekemîn yê koçberiyê de xwe bi rêxistin kir û dest bi xebatên vekirina dibistan û peymangehan kir, rûxmî şert û mercên zehmet di dirêjahiya 5 salan de destkeftî û serkeftinên mezin qezenc kirin. Li kêlek dibistanan û peymangeha Ş Viyan Amara, di 2021’an de Peymangeha Tenduristiyê hat vekirin. Li ser 2 salan peymangeh ber bi dawîbûna sala xwendinê ve diçe û xwendekar dest bi amedekirina pirûjeyên derçûna yekemîn dewre, dikin. Pirojeyên xwendekaran yên derçûnê, yekemîn care pêk tê. Wê xwendekar di nava gel de semînerên xwe bidin û li gorî wê bên nirxandin.

Têkildarî pirojeyên Peymangeha Tenduristiyê a herêma Şehbayê, hevserokê peymangehê Reşîd Îbiş ji rojnameya me re axivî.

### ’Li gorî pêwîstiya herêmê Peymangeha Tenduristî hat vekirin’

Reşîd di destpêka axaftina xwe de destnîşan kir ku Peymangeha Tenduristiyê li gorî hewcedariya qada tenduristî hat vekirin û wiha got: “Herêma Şehbayê piştî derbasbûna gelê Efrînê di aliyê tenduristî de, rastî zehmetiyan di aliyê tenduristî de hat. Di nexweşxaneya Avrîn û ya Til Rifetê kêmbûna kadroyên tenduristî hebûn û ev yek heyanî niha jî berdewam dike. Ji ber vê yekê biryara vekirina Peymangeha Tenduristî di Şehbayê de li gorî hewcedariya qada Tenduristî hat dîtin û di sala



2021’an de hat vekirin.”

### ‘Armanca me avakirina kadroyên tenduristiyê yên pirofesyonal e’

Memoste Reşîd da zanîn ku di peymangehê dê beşên sereke yê girêdayî tenduristiyê hatin vekirin, herwiha yekemîn sal bi 32 xwendekaran destpê kir û wiha domand: “Armnaca peymangehê amadekirina kadroyên tenduristiyê yên perefesyonal ku bikaribin destekê bidin nexweşxane û gelê herêmê. Li ser wê esasî beşên serek yên ku hatin vekirin; (bingeha Tenduristiyê, Temrîd, beşa zarokan, zadxwarin û ambolans..), her wiha hin madeyên din weke (Bîrkarî, zimanê Erebî, zimanê Îngilîzî, zimanê Kurdî, Kîmîa, Kombiyoter û zindiyên biçûk). Her wiha di sala yekemîn de 32 xwendekaran nave xwe tomar kir, hejmarê niha em gihîştin dawiya salên xwendinê ji 32 xwendekaran 17 xwendekar bi ser ketin û dest bi amedekirina pirojeyên derçînê kirine”.

### ‘Yekemîn care pirojeyên derçûna xwendekaran di nava gel de tên pêkanîn’

Reşîd diyar kir ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ev yekemîm tecrûbe yê pirojeyên derçûna xwendekaran tê pêşxistin û wiha



Reşîd Îbiş

got: “Pirojeyên derçûna xwendekaran wê vê carê bi şêwazekî cuda be, ev şêwaz heyanî niha nehatiye pêkanîn. Xwendekar wê nêzî heyvekê pirojeyên xwe bi riya semênerên girêdayî nexweşiyan di nava gel de bidin. Semênerên werin esas girtin ev in (Leşmaniya, Kolêra, semînerên girêdayî jin weke feydeya zayîza xwezayî her wiha girîngiya mêjandina dayîkê ji bo zarokan û rê û rêbazên dermankirina şikestinan û şewtandinan hwd). Armanca me ji dayîna van semîneran ewe ku em asta têgihîştina gel ji nexweşiyan re û şêwazê bê re tevgerandin bilindtir bikin, di heman demê de girêdanbûnek di navber gel û xwendekarên tenduristiyê de bê çêkirin. Her wiha em bikaribin ew hişmendiya xwe li ser nexweş û gel re girtin em ji holê rakin û avakirina kadroyekî xwedî çand û exlaqê xwe yê rast armanc dikin. Bê guman ev semêner wê ji aliyê mamosteyan ve bên şopandin û di dawiyê de li gorî çavdêriyê wê nirxandin bê kirin”.



Şêrîn Reşîd

### ‘Bi Rihê berxwedan û têkoşînê me xwendina xwe bi dawî kir’

Xwendekara peymangeha tenduristiyê Şêrîn Reşîd bi bûneya bidawîbûna sala xwendinê hest û armanca xwe wiha anî ziman: “Derketina ji Efrînê li ser derûnî û piskeolojiya me bandoreke mezin da avakirin. Me bawer nekir ku em careke din bixwînin û em xeyalên xwe û malbata xwe pêk bînin. Bi rastî sîstema xwendinê kêliyekê jî ranewestî li gor kêm derfetan tavahî xwendekar pêşwazî kirin û niha ew xwendekar derbasî zanîngeh û peymangehan dibin û derdiçin jî. Ji bo me di nava van zehmetiyan de xwendin cihê serbilindiyê ye û pir şanazin ku bi rihekî tijî berxwedanê, têkoşîn û îsrardarî me karî xwendina xwe bidawî kiriba. Em xwendekarên peymangeha tenduristî bi hêvî ne em ji gelê xwe re bibin cihê destekdaîn û baweriyê ku li gorî texmîn û hêviyên wan bin.”



# Ciwan berê xwe didin qadên berxwedanê

Tevlîbûna nava refên gerîlayên azadiyê dewam dike, di vê çarçoveyê de 20 ciwanan bi daxuyaniyekê ragihandin ku ew tevlî nava refên gerîla bûne û gotin;“Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, ji bo hilanîna tola şehîdan, ji bo avakirina jiyaneke azad ji mezlûman re em tevlî nava refên gerîla dibin.”

**Navenda nûçeyan**

Komalên Ciwan û Komalên Jin ên Ciwan dest bi kampanyayên ‘Cenga Azadiyê bi ser bixin” û “Jin, Jiyan, Azadî bi ser bixe azadî” dabûn destpêkirin û di çarçoveya kampanyayê de bang li ciwanan kiribûn ku tevlî nava refên gerîla bibin.

Di 15’ê Tebaxê de komek ji 20 jin ên ciwan bersiv dan vê bangê û bi tevlîbûna xwe Cejna Vejînê ya 15’ê Tebaxê pîroz kirin, bang li ciwanên li çar parçeyên Kurdistanê kirin ku tevlî nava têkoşîna azadiyê bibin. Îro jî 20 ciwan bi daxuyaniyeke çapemeniyê ragihandin ku ew tevlî bûne.

Şervanên ciwan gotin,“Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, ji bo hilanîna tola şehîdan, ji bo avakirina jiyaneke azad ji mezlûman re em tevlî nava refên gerîla dibin.”

### Ciwanan daxuyaniya xwe bi vî rengî dan:

“Weke ku tê zanîn ji aliyê Tevgera Komalên Ciwan û Komalên Jinên Ciwan ve hemleya Cenga Azadiyê Serbixin û “Jin Jiyan Azadî Serbixe Azadî” hate destpêkirin û di çarçoveya vê kampanyayê de bang li ciwanan hate kirin ku di nava refên gerîla de têbikoşin.

Di 15’ê Tebaxê de komek ji 20 jinên ciwan bersiv dan vê bangê û bi tevlîbûna xwe 15’ê Tebaxê Cejna Vejînê pîroz kirin û ciwanên li çar parçeyên Kurdistanê vexwendibûn Têkoşîna Azadiyê. Komek ciwan a ji 20 kesan pêk tê hem banga rêxistinên ciwanan kirin û hem jî banga jinên ciwan ên têkoşer guhdar kirin û bi daxuyaniyeke çapemeniyê tevlîbûna xwe ji raya giştî re ragihandin.



Ciwanan diyar kirin ku sedema sereke ya tevlîbûna wan Rêber Apo ye û gotin, “Em ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, ji bo tolhildana şehîdên xwe û avakirina jiyana azad ji bindestan re tevlî nava refên gerîla dibin.”

Ciwanan diyar kirin ku ew dixwazin bi gerîlayên li çiyayên azad şer dikin re bin û gotin, “Em ê li kêleka gerîlayên ku tevî hemû êrîşên dijmin li ber xwe didin.”

Ciwanan diyar kirin ku dixwazin bibin bersiv ji kampanyayên ku di demên dawî de hatine destpêkirin û gotin,“Em bi tevlîbûna xwe 39’emîn salvegera Pêngava 15’ê Tebaxê pîroz dikin û bang li hemû ciwanên Kurdistanê dikin ku ber bi refên azadiyê ve biçin. Em soz didin ku em ê çekên şehîdên Zap, Metîna û Avaşînê rakin, têkoşîna şoreşê bidin meşandin, xeyal û armancên wan pêk bînin.”

### Daxuyanî Ji bo reya giştî!

“Weke tê zanîn ev zêdeyî 2 sal in ku tu agahî ji Rêber Apo nayên girtin. Tecrîda li ser Rêbertî polîtîkaya qirkirina gelê Kurd e. Dewleta Tirk a faşist, qirker dixwaze Rêbertî ji me qut bike; lê bi helwesta şoreşgerî û dîrokî Rêber Apo ev polîtîka vala derxist, her wiha hişt ku em rastiya xwe bibînin ku “Kes Nikare Roja me Tarî Bike”. Rêber Apo di van 50 salên têkoşîna şoreşgerî de bê hejmar hevrêyên qehreman ên ku jiyana xwe ji bo şoreşê û jiyana azad feda kirine ava kir û perwerde kir. Kompoloya navneteweyî ya li dijî Rêber Apo, encama tirsa ku li ser hêzên hegemonîk ên moderníteya kapîtalîst ferz kir. Berxwedana Rêber Apo ya li Îmraliyê nîşan da ku gotina wî ya “mirov hêza herî mezin e” heqîqet e. Berxwedana Rêbertî bi felsefeya Şoreşê hîn zêdetir pêş ket û paradîgmaya Neteweya Demokratîk li cîhanê hate naskirin.

Meha Tebaxê ji bo tevgera azadiyê dîrokî ye, di 15’ê Tebaxa 1984’an de yekem guleya li dijî dijmin hate avêtin, pêvajoyeke nû ya ji nû ve zayîna gelê Kurd û têkoşîna li dijî zilm, qirkirin û faşîzmê destpê kir. Ji çalakiya Fermandar Egît gelê Kurd bi xurtî li hemberî dijmin dest bi helwesteke xurt kir û di têkoşîna şoreşgerî de qonaxeke nû hat dest pê kirin. Bi ruhê Fermandar Egîd, her wiha bi ruhê fedayî yê Heval Zîlan bi hezaran ciwan berê xwe dan çiyayan û ber bi azadiyê ve meşiyan.

Bi vî ruhê şoreşgerî em ê jî tevlî vê meşa azadiyê bibin. Ji bo li kêleka hevrêyên qehreman ên ku niha li çiyayên azad ên li Herêmên Parastinê yên Medyayê li Zap, Avaşîn û Metîna xwedî derdikevin re bibin mil bi mil. Li hemberî hemû êrîşên dijmin ên ku hemû teknolojiya NATO’yê bi kar tîne û çekên kîmyewî û qedexe jî di nav de bikar tîne, lê rûxmê van hemûyan gerîla dîsa jî li ber xwe didin û di parastina xaka pîroz a çiyayên Kurdistanê derbeyên mezin li dijmin dixin.

Em jî weke ciwanên ku li ser paradîgmaya Rêbertî dimeşin, êrîşên faşîst û hovane yên dijmin qebûl nakin û em yekane biryara ku bi rastî dikare ji pirsgirêkên îro gelê me re rû bi rû maye çareser bike, digrin. Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, ji bo tolhildana şehîdên me, ji bo avakirina jiyana azad ji gelên bindest re em tevlî nava refên Gerîlla dibin. Di çarçoveya kampanya Komalên Ciwan û Komalên Jinên Ciwan CENGA AZADI SERBIXIN û JIN JIYAN AZADI SERBIXE AZADÎ ve em bersivê didin banga fermandar Heval Cemal. Her wiha em bang li hemû ciwan û jinên ciwan ên 4 parçeyên Kurdistanê û hemû ciwanên ku di bin êrîşên dijmin de ne, dikin ku tevlî vê meşa azadiyê bibin. Tevlî gerîllayên moderníteya demokratîk bibin, tevlî gerîllayên azadiyê bibin.

Em bi tevlîbûna xwe salvegera 39’emîn a Cejna Vejînê 15’ê Tebaxê pîroz dikin. Em soz didin ku em ê çeka şehîdên Zap, Metîna û Avaşîn hilgirin û têkoşîna şoreşgerî bimeşînin, xewn û armancên wan bixin pratîkê. Em ê bi têkoşîna şoreşgerî ya azadiya gelê xwe bi ser bikevin.”

# Berhema xebata komînal

**Şêniyên kantona Qamişlo bi xebateke komînal kehrebe peyda kir û bang li şêniyên hemû gundan kir ku xwe bispêrin xwe û mîna wan bikin.**

Li 2 gundên navçeya Tirbespiyê şêniyan gelek xebat bi awayekî xweser û komînal pêk anîn. Şêniyên gundê Dugurê yê rojavayê navçeya Tirbespiyê û gundê Xirbet El Dîb ê başûrê rojavayê navçeyê, bi xebateke komînal 2 jenerator kirîn û li gor pergala ampîran kehrebe li malên gund belavkirin.

Ev her du gund li ser girîngiya birêxistinkirinê û çawa ev rêxistinbûyîn dikare zehmetiyan derbas bike mînak in.

Hevserokê komîna gundê Xirbet El Dîb Xelîl Miho got:”Hevkariya di navbera şêniyên gund de nîşan dide ku ew bi xaka xwe ve girêdayî ne û ji bo pêşxistina rewşa gundê xwe, xwe berpirs dibînin.”



### Civîna komînê û danîna çareseriyê

Miho destnîşan kir ku wan li komîna gund civînek li dar xist û di civînê de rewşa kehrebeyê û çareseriya pirsgirêka qutbûna kehrebeyê nîqaş kirin û wek encam beşdaran li hev kir ku buhayê jeneratorekê di nav hev de kom bikin û wê bikirin.

Miho wiha domand: “Di encamê de êdî kehrebe li gund li gor pêwîstiya şêniyan peyda dibe. Bi vê xebata xwe me rê li pêşiya keysbazan girt ku buhayê ampîrê keysbaz bikin.”

Li gor Miho, komîteyek ku ji endamên komîna gund pêk tên, çavdêriya xebitandina jeneratorê dike.

### Komîn bingeha çareseriyê û banga xwespartinê ye

Hevserokê komîna gundê Dugurê Mihemed Seîd destnîşan kir ku komîn, bingeha çareseriya pirsgirêkan e ku li gundê wan bi rêya komînê şêniyan gelek xebat ji bo gund pêşkêş kirin wek avakirina navendeke sersaxiyê, paqijkirina çemê gund û li vê dawiyê jeneratorek kirîn.

Seîd bang li şêniyên gundên derdorê kir ku di pêşxistina rewşa gundên xwe de xwe, bispêrin xwe û li gor sîstema komîn û Rêveberiya Xweser tev bigerin.

Mihemed Seîd da zanîn ku komîteyên xizmetguzariyê û sotemeniyê yên navçeya Tirbespiyê piştgiriya projeyên wan kirin û ji wan re sotemenî peyda kirin.

# Zarokê 10 salî li Îranê hate qetilkirin

**Zarokê 10 salî Îhsan Yûsifzahîli Delganê ji aliyê îstixbarata Îranê ve hat qetilkirin.**

Zarokê Belûc Îhsan Yûsifzahî yê 10 salî roja 19’ê Tebaxê li bajarê Delgan ê eyaleta Sîstan û Belûcistanê ya Îranê ji aliyê îstixbarata Îranê ve hat qetilkirin.

Gorî agahiyan îstixbarata Îranê dema ku Belûc Îhsan Yûsûzahî ji bajarê Delganê bi motorsîkleta xwe diçû gundê Mandê yê navçeya Jalgayê gulebaran kir. Îstîxbarata Îranê îdia kir ku bi hinceta ‘hişyariya raweste’ pêk neaniye gule li ser zarok reşandine.

Rejîma Îslamî ya Îranê her sal bi dehan welatiyên Belûc bi hincetên nedadperwerî digre



û dikuje.

Rêjîma Îranê ne tenê zarokan qetil dike, herwiha jin û mêran jî, bi hincetên cûda dikuje, Hêjay gotinê ye ku kolber û kasibkar rojane li rastî êrîşên rejîma Îranê tên. Ev kolber û kasibkarane di dema ji bo debara mabata xwe bikin û nebûna kar neçarî karê bazirganiya ser sînoran dikin. Lê her carê rejîma Îranê êrîşê wan dikin û wan didin ber gueyan, dikuje.

ROJ NEWS

# Banga yekrêziya kurdî

Rewşenbîr, nivîskar û seyasetmedarên Rojavayê Kurdistanê banga Yekrêziya Kurdî kirin û gotin, ji bo bidestxistina mafê gelê Kurd û têkbirina dagirkeriya li ser Kurdistanê yekrêziya gelê Kurd pêwîste.


**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di navbera xewin û rastiya gelekî ku bi sedên salan rastî êş û zordariyan hatiye, lê qet ji banga yekîtiyê venegeriya ye, bi 10'ê caran pêşeng, wêjevan, nivîskar, rewşenbîr û helbestvanên kurd banga yekîtî û yekrêziya gelê kurd kirine.

Destpêkê hestên netewî û xwesteka yekrêziya kurdî li cem helbestvanê kurd yê kilasîk Ehmedê Xanî hatiye peydakirin. Wî bi 10'an malik li ser girîngiya yekîtiya netewî hûnandine û bû xemxurê gelê kurd. Êdî bi dû wî de gelek helbestvanên kurd mijara netewî kirin nav helbestên xwe de. Helbestvanê Kurd yê navdar Seydayê Cegerxwîn jî di derbarê xeteriya nehvrêziya kurdî de wiha dibêje: “Kurdno bibin yek, ger hûn nebin yek hûn ê herin yek bi yek!.” Herwiha Têkoşerê Kurd Qazî Mihemed jî berî ku were bidarvekirin gelek şîret ji bo gelê kurd li pey xwe hiştin. Yek ji wan şîretan jî şîreta yekîtiya kurdan bû. lewma dibêje; Yekîtî û hevdengiya nav xwe biparêzin, ji hev re nebaşiyan nekin, bi taybetî jî di berpirsyarî û xizmetê de tima nebin.

Di sala 1999'an de Rêber Apo di hevdîtineke xwe ya bi parêzerên xwe re, daxwaza ku demildest kongreyek neteweyî, sîwanek neteweyî were avakirin kir.

Li ser vê daxwazê, gelê kurd ji bo yekîtiya neteweyî mîsoger bike û pêş bixe, pêwîstî bi vê projeyê dîtin. Li ser vî asasî jî di sala 1999'an de Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) hat avakirin. Di demekî kurt de gelek partî û rêxistinên kurd tevlî xebatên KNK'ê bûn. KNK'ê ji bo yêkitiya neteweyî saz bike, dest bi xebatan kir. Ev yek hêdî hêdî ber bi encamgirtinê ve diçû. Di sala 2013'an de li Hewlêr konferanseke dîrokî hat lidarxistin.



**Cemal Çaçan**



**Yûsiv Kûtê**



**Xalis Misewer**

Weke hertim armanca dagirkeran perçekirin û tunekirina kurdan e, yek ji nimûneyên dîrokî ya berçav û xwedî bandor ta roja me ya îro hevpeymana Sykes-Picot û Lozanê ye, ku di wan hevpeymanan de Kurdistan kirin çar perçe û her perçeyek di bin desta dewletekî desthiledar de danîn. Her dewletek jî gelê ku li perçeya xwe dijiya li gorî xwe û bi siyaseta bişaftinê re rû bi rû hiştine. Lê belê ev siyaset bandoriya xwe li hin kurdan kir ku rastiya xwe ji bîr kirin, lê dîsa hin Kurd jî ji rastiya xwe dûr neketin û di cewherbûna xwe israskirin û li ber xwe dan.

Li ser vî asasî gelê Kurd ji destpêka dîroka desthiledariyê 5000 B.Z ta roja me ya îro li hemberî desthildaran û dagirkeran berxwedaniyeke mezin a hebûn û tunebûnê dikin. Armanca vê berxwedanê jî diyar e ku li ser hebûna xwe israr dike, her ku êrişên wan dagirkeran mezintir dibe li hemberê wê berxwedan û yekbûna gelê Kurd xurtir dibe, ev jî di berxwedanên ku herî dawî hatin jiyîn; wek berxwedana xwseriyê li Bakurê Kurdistanê, Berxwedana Serdemê li Efrînê, berxwedana ku anha tê jiyîn li Rojavayê Kurdistanê û Qadên Berxwedanê, berxwedana rûmetê bi şêweya xwe ya herî zelal derket holê.

Derbarê girîngiya pêkanîna yekrêziya Kurdî rewşenbîr, nivîskarên û siyastmedarên kurd yên Rojvayayê Kurdistanê ji rojnameya me re axivîn.

### ‘Nehevrêzî ji bo gelê kurd êş û azaran tîne’

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê Cemal Çaçan destnîşan kir ku gelê kurd gelek êş ji ber nehevrêziyê kişandiye, lewma divê xwe ji van êş û azaran xelas bike û wiha got: “Ger em dîrokê bi şûn de vegerînin, em ê nehevrêzî û parçebûna kurdan ji dema ku Kurdistan di Peymana Qesra Şêrîn de bû 2 parçe, bibînin. Piştî wê jî careke din jî, di encama Peymana Lozanê de ev yek hat dubarekirin. Ji serdema Peymana Qesra Şêrîn heya roja me ya îro lawazbûna gelê kurd û partiyên siyasî hate diyarkirin. Mixabin kurdan nikarîbûn destekê bidin hev û li hember dijminên xwe bibin yek. Di heman demê de gelek partiyên siyasî jî bi hev re nebûne alîkar, berovajî vê yekê, hin kurd ji bo berjewendiyên dijminên xwe kar kirin. Ji ber van şaştiyan heya niha gelê me êş û azaran dikşîne û rojane rastî kuştin û qirkirinê tên. Da ku ev şaştî dubare nebin pêwîste ku gelê kurd û partiyên siyasî birengekî cidî nêzî pirsgirêkê bibin û çareseriyekê ji bo kurdan bibînin. “

### ‘Pêkanîna Yekrêziya Kurdan erka rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd e’

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê, Yûsiv Kûtê diyar kir ku pêwîste rewşenbîr,hunermend, nivîskar û siyasetmedarên kurd hewl bidin yekrêziyeke kurdî ava bikin û wiha domand: “Îroj hêzên desthilatdar yên cîhanî dixwazin cîhanê bigiştî bixin bin serweriya xwe de. Herwiha ji bo berjewendiyên xwe jî hewi dinin ku şerekî cîhanî yê 3'yem li dar bixin. Cihê herî guncav ji bo wan jî, Kurdistan û Rojhilata Navîn e, yek ji van hêzan jî dagirkeriya Tirkî ye. Dagirkeriya Tirk ji bo gelê Kurd dijmina yekem e. Ev dagirkerî dixwaze gelê kurd tune bike. Divê gelê kurd, hêzên kurdistanî û partiyên siyasî ji bo vê yekê hayedarbin. Herwiha yekrêziyek çêbibe ku bibe bersiv ji van kiryarên ku bi serê gelê kurd de tên. Em weke rewşenbîr, nivîskar, hunermend û siyasetmedarên kurd destnîşan dikin ku pêwîstî bi yekrêziya gelê kurdî heye. Divê em hemû jî hewl bidin ku kongireyeke netewî ji bo yekîtiya kurdan ava bikin. Ji bo ku dijmin Lozaneke din dubare neke. Ev yek çareya herî baş e. Di heman demê de em ê bi vî rengî welatê xwe azad bikin û bighêjin mafê xwe.”

### ‘Qadên Berxwedanê ji kurdan re pişt e’

Nivîskar Xalis Misewer tekez kir ku Qadên Berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê ji kurdan re pişt e, lewra divê PDK'ê jê re nebe xencer û wiha got: “Em tev dizanin ku tunekirina gelê kurd armanca dewleta Tirk ya dagirker ya serke ye. Ev dagikerî rojane êrîşî Başûr, Rojava, Bakurê Kurdistanê dike. Bêtirî xwe jî êrîşî Gerîlayên Azadiyê yên ku li çiyayên Kurdistanê bûne xeta parastina Kurdistanê, dikin. Mixabin PDK'ê jî bi awayekî eşkere hevkariya dagirkeriya Tirk dike. Em weke rewşenbîr, nivîskar, hunermend û siyasetmedarên kurd vê hevkariyê şermezar dikin. Herwiha em tînin ziman ku siyaseta mala Berzanî û PDK'ê dike, li dijî gelê kurd û yekrêziya me ye. Em tev dizanin ku Qadên Berxewedanê û çiyayên Kurdistanê ji gelê kurd re pişt e. Lewma divê PDK'ê ji gelê kurd re nebe xencer û hevkariya dagirkeriya Tirkî neke. Lê ya baş ew e ku PDK'ê ji riya xiyanetê vegere. “

# `Polîtîkeya mişextkirinê armanc pêkanîna guhertina demografîke`

**Serokê Nivîsgeha Koçber û Penaberan a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Şêxmûs Ehmed destnîşan kir ku mişextkirin şerekî taybet e ku li dijî gelê Sûriyeyê bi taybetî li dijî ciwanan tê meşandin e, armanca wê valakirina herêmê û guhertina demografiya wê ye.**



Dewleta Tirk a dagirker hemwextî êrişên li dijî herêmê pêk tîne, şerê xwe yê taybet li dijî şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê didomîne û wan bi darê zorê koçber dike. Çavdêran destnîşan kir ku armanc ji van şeran dagirkirina herêmê û penaberkirina şêniyên wê ye, da ku di encamê de projeya Rêveberiya Xweser têk bibe.

Girêdayî vê mijarê, serokê Nivîsgeha Koçber û Penaberan a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Şêxmûs Ehmed wiha axivî:”Dewleta Tirk a dagirker ji bo pêkanîna armancên xwe hemû awayên şeran bi kar tîne, şerê herî girîng şerê taybet e ku armanc jê valakirina herêmê û guhertina demografiya wê ye.” Şêxmûs Ehmed wiha domand:“Hin tore hene ji aliyê îstixbarata Enqereyê ve tên birêvebirin. Ev tore bi qaçaxî ciwanan ji herêmê derdixin. Ji ber koçberên di daristanên Yewnanistanê û Bolgaristanê de ji ber birçîbûn û tîbûnê jiyana xwe ji dest dane, em xemgîn in. Hin komên qaçaxiyê koçberan şantaj dikin, di deryayan de bi sedan ciwan, jin û zarokên sûriyeyî bûn qurbana vî karî.”

Ehmed bang li şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û yên seranserî Sûriyeyê kir û got: “Divê gelê me yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi taybetî jî ciwan, xaka xwe û herêma ku bi xwîna keç û xortên wê hatiye rizgarkirin, biparêzin û bibin bingeha vê projeya niştîmanî.”

Ehmed wiha lê zêde kir:”Divê ciwanên me siyasetên dewleta Tirk a dagirker ên bi armanca valakirina herêmê ji ciwanan nas bikin ku ew jî bingeha welêt in. Divê em destkeftiyên Şoreşa 19'ê Tîrmehê biparêzin û Sûriyeyeke nenavendî û demokratîk ava bikin da ku bibe navenda derketina şoreşên gelên herêmê bi giştî.”

Şêxmûs diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker bi rêya kiryarên xwe yên dermirovî wek qutkirina ava Firatê û ava stasyona Elokê hewl dide ku tevliheviyê peyda bike û gel ji Rêveberiya Xweser dûr bixe.

Di dawiya axaftina xwe de Ehmed got:”Rêveberiya Xweser ji gel hatiye avakirin, gel dikare vê herêmê bi rê bibe, biparêze û planên dewleta Tirk a dagirker têk bibe.”



# ‘Bi Bêdengiya Cîhanê re Kiryarên Dagirkeriyê Zêdetir Dibin’

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi hezaran sûcên giran li dijî gelê Efrînê kirine, bi taybet jin û zarok dibin armanc, Efrîna ku bi navê bajarê aşîtiyê û demokrasiyê dihat nasîn, îro ji aliyê dagirkeriyê ve veguheriye navenda sûcên dijmirovî. Endama Meclisa PYD'ê Îlham Mihemed diyar kir ku ji ber bêdengiya navnetewî sûcên dagirkeriyê li Efrîn zêdetir dibin û tevahiya nirxên mirovahiyê tê binpêkirin.

**Esma Mistefa/Şehba**

Kiryarên dagirekeriya Tirk û çeteyên wê di hundir Efrînê de û bi taybet li dijî jin û zarokan, tevahiya rêgezên exlaqê derbas kirin e. Rojane jinên Kurd bi destê çeteyan û artêşa dagirkeriya Tirk tên revandin, tecawîzkirin û qetil kirin. Herwiha ji bo wergirtina baceyan gef li jinan tên xwarin û rojane ev destdirêjî zêdetir dibin. Herî dawî li Efrînê, li navçeya Cindirêsê keçikek temen 14 salî ji aliyê yek ji endamên meclisa çeteyan ya herêmî û lawê wî ve hat tecawîzkirin. Piştî ku hatiye ravandin, malbata wê bi kuştinê hatine tehdîd kirin. Bi 100'an jinên Efrînê di girtîgehan de çarenûsa wan ne diyar e, hemwelatî, jin û zarokên di malên xwe de jî çarenûsa wan di destê komên çete û artêşa faşîzmê de ne.

Girêdayî sûcên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ku li dijî gelê resen û bi taybetî li dijî jinan tên kirin, endama Meclisa Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Îlham Mihemed ji rojnameya me re axivî.

### ‘Çete hemû nirxên mirovahiyê binpê dikin’

Îlham di destpêkê da xuyakirin ku ev zêdetirî 5 sala ne ku destdirêjî li jinên Kurd li Efrînê tê kirin û wiha got: “Bi dagirkirina Efrînê, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê dest bi talan kirin, revandin, kuştin, tecawîzkirin û binpêkirina tavahî nirxên mirovî, kirin. Ji destpêka dagirkeriyê ve bi hezaran jin û zarok hatine revandin, tecawizkirin û herî dawî hatine kuştin. Li aliyekî din dijî, her roj mal tên hilweşandin, dar tên qutkirin, cihên dîrokî tên talankirin, her wiha guhartina demografiya herêmê ya ku bi riya bicihkirina xelkên ereb yên herêmên din û avakirina malên mêtîngeriyê, dewam dike.”



### ‘Cîhanê çavên xwe li hember heqîqetê girtiye’

Îlham destnîşan kir ku tavahî rêxistinên mirovî û hêzên navnetewî li hember binpêkirinên di herêmên dagirkirî de tê kirin bê dengin û wiha domand: “Di hundir herêmên dagirkirî de ewqas sûc û binpêkirinên ku hemû astên bê exlaqê derbas kirine tên kirin. Hemû kiryar bi awayekî giştî hatine belgekirin û ji raya giştî re hatine ragihandin. Lê belê tê dîtin ku hemû rêxistinên parastina mafê zarokan yên navnetewî û hêzên navnetewî li hember van kiryaran bê deng dimînin û tu bertekên cidî heyanî niha nedane nîşandan. Ev yek tenê hevkariya wan bi faşîzmê û komên çeteyan re dide nîşandan. Her wiha di bûyera dawiyê de, ku keçikek temen bûçûk ji aliyê serçeteyekî û lawê wî ve di bin darê zorê de tê tecawîz kirin, ev yek sûceke nayê efû kirin, di derheqê mirovahî û zaroketiyê de, di heman demê de bi hezaran bûyerên bi vî rengî hatine jiyan kirin. Tevî van hemû belgekirinan jî, cîhan çavê xwe li hember rastiyê girtiye.”



### ‘Tevger û Rêxistinên navneteweyî divê xwe berpirisyar bibînin’

Endamê Meclisa PYD Îlham Mihemed di dawiya axaftina xwe de bang li tavahî rêxistinên jin û mirovî yên cîhanî kir û wiha got: “Her çi dibe bila bibe, divê li hember van bê exlaqiyên ku li dijî jinên Kurd û zarokan de tên kirin em bêdeng nemînin. Divê em dengê xwe ji giştî cîhanê re raghînin, bi taybet tevger û rêxistinên jin û zarokan yên cîhanî li hember van kiryaran bê rol nemînin û xwe berpirsyar bibînin, her wiha erkên xwe yên exlaqî pêk bînin.”

## Li Sûriyê sebra gel bi dawî dibe



**Zekî Bedran**

Eger em li ser pirsa li Sûriyê çareserî yan jî jihevketin heye nîqaş bikin, dê ne şaş be. Di rewşa heyî de li holê çareseriyek tune ye. Diyare di demek nêz de jî tiştek wiha çênabe. Hewldan û hesabên heyî ji çareseriyê zêdetir jihevketinê didin nîşan. Li Sûriyê rewşa aborî karesatek e, hilweşîn û jihevketin tê jiyîn. Pir zehmete em bersiva pirsa gelo gel çawa henase digire û çawa dijî, bidin. Rewş hatiye wê astê ku daxuyaniyên siyasî û zanista aborî derbas dikin. Yên li Şamê rûniştine nafikirin ku di pergalê de guherînekî çêbikin. Kar tune, heqdest qalikê gûzekî tijî nakin. Her ku diçe dolar bilind dibe. Di beranberê vê de gelek tişt li bazarê nayên dîtin û nirx bilind dibin. Mafê gel ê nîqaşê, rexnekirin û rêxistinbûnê tune ye. Ragihandin jî di nav de, hertişt di destê hikumeta navendî de ye. Di pergala Baasê de israr dike.

Derdorên ronakbîr û demokratîk ên Sûriyê belave ne û beşek girîng ji derveyî welat in. Ji ber nikarin li welatê xwe bijîn, mayîna wan a li welat nayê pejirandin. Yên derketine derve jî ne rêxistinkirî û bê bandor in. Belavî welatên cuda bûne. Yên çûne welatên Ereban, nikarin ji derveyî welatan tev bigerin. Hertim di bin zextekî de ne. Yên ku di bin sêwana Tirkiyê de kom bûne, Kurd an jî Ereb tenê dikarin sîxwiriyê bikin. Ji derveyî wê şansê wan tune ye ku hebin. Kesên ku Tirkiye wan weke muxalefetê nîşan dide nasnameya xwe winda kirine, bûne duvikê polîtîkayên dagirkeriyê. Weke hêzên Tirk ên niçîriyê, di dagirkirina Sûriyê de rol dilîzin. Li şûna ku ji bo berjewendiyên gelê Sûriyê û damokrasiyê kar bikin, bûne pêlîstokên dagirkeriya Tirk û dagirkeriya Tirk diparêzin. Bûne amûrên zilmê û talanê ku li ser gelê xwe didin meşandin.

Bakur û Rojhilatê Sûriyê di wateyek rast de pergalek demokratîk ava kiriye û modeleke ku hêviya pêşerojê dide. Rêveberiyên Xweser bi pergala meclisan xwe rêve dibe. Tevahî gel, bawerî û çand di nava aştiyê de bi hev re dijîn û bi azadî xwe îfade û rêxistin dikin. Rewşa aborî jî qasî bi Şamê re neyê raberkirin, baş e. Dikarin bêjin, herêmên xweser ne tenê ji bo Şamê, di tevahî Rojhilata Navîn de bûye stêrkek ku dibiriqe. Lê ji bo ku wê ji holê rakin, gelek hêz bi hev re kar dikin.

Dewleta Tirk bê nîqaş, bê şert û merc ji bo qirkirina Kurdan temam bike bi hemû hêza xwe dixebite. Bûye çavkaniya tevahî xirabiyan û tevahî xirabiyên bên aqilê mirov rêxistin dike. Rêveberiya Şamê jî bi heman şêweyî ji bo Rêveberiya Xweser tune bike, bi israr kar dike. Li aliyekî netewperestiya Ereb har dike, li aliyê din bi tora îstixbaratî eşîran zêde dike, hewl dide tevlîheviyan derbixe û herêmê bê istiqrar bike. Îran parçeyek ji vê xebatê ye. Jixwe nêrînek Îranê ya weke demokrasiyê tune ye. Heman demê de li herêmê li dijî Îslama Sûnî mezhebê Şîîa rêxistin dikin. Di bin navê alîkarî û dostaniyê de hatiye welatekî û operasyonên bi vî awayî dike, ev mijarek din a nîqaşê ye. Rûsya jî li şûna Sûriyeyek demokratîk hewl dide Baasê li ser desthilatê bihêle.

DYE û welatên endamên koalîsyonê jî ne xwedî projeya Sûriyeyek demokratîk in. Daxwaz û derdek wan ê bi vî awayî jî tune ye. Jixwe Tirkiye hertim DYE yê ji ber Kurdan sûcdar dike. Weke welatekî ku hevkariya terorê dike û piştgiriyê dide terorê sûcdar dike. DYE, endamtiya Tirkiyê ya di NATO'yê de derdixe pêş û dest navêje pirsgirêka Kurd. Welatên Ewropayê jî bi heman awayî ne. Çar dewletên beşdarî Astanayê bûn, ji bo derxistina DYE yê ya ji Sûriyeyê bûne yek.

Em hertim berjewendî û nakokiyên di navbera dewletan de tînin ziman. Sedemê ku em evqas tînin ziman ew e ku ji bo çareseriya Sûriyê hewl nadin. Tu jê kê dipirsî dibêjin em ji bo çareseriyê li Sûriyê ne, lê çareseriya herkesî li gorî berjewendiyên wan in. Gelê Sûriyê di nava şerên cuda yên berjewendî û hêzan de dibe qurban. Yê ku gel bifikire û li gorî berjewendiyên gel tev bigere tune ye. Berovajî, di serî de Tirkiye û hinek dewletên din ji bo şer û pevçûnên nû rê çêdikin.

Li gorî nûçeyên di ragihandinê de herêmên weke Deria û Swêdayê gel bihabûnê protesto dike, derdikeve kolanan. Eger lêgerîn û daxwazên wiha yên demokrasiyê belav bibin û gel beşdarî pêvajoyê bibe, dibe ku lîstokên dagirker û desthilatan vala derbikevin, qet nebe hinek bên sînordarkirin. Me hertim diyar kir ku çareseriyek a xwe dispêre dewletan tune ye, gel tê jihevxistin. Eger li Sûriyê li şûna jihevketinê çareseriyek bibe, neçare ev çareserî xwe bispêre gel. Ji ber wê jî pêwîste gelê Sûriyê û hêzên demokrasiyê aktîvtir bikevin dewrê.

## Dîsa PDK…



**Farûk Sakik**

Dîsa PDK ket rojeva rojnamegeriya me. Dema ku em PDK'ê hişyar dikin, dibêjin hûn şerê birakûjiyê sor dikin. Na em wisa nakin.

Di 2 nivîsên xwe de, ev mînak min dabû lê ez ê dîsa sêbare bikim. Kiryarên van rojên dawî me neçar dike ku em vê mînaka dîrokî dîsa bi bîr bixin.

Di dema Împaratorya Persan û di dawiya şerê Peloponnessos de Qral Daryûsê duyem dimire. Piştî mirina wî, di navbera her du kurê wî Artakserkses û Kyros de ji bo desthilatê şer dest pê dike. Kyros diçe ji rojhilatê Anatoliya, li herema Grek artêşek bi pere kom dike, tîne û li dijî birayê xwe dide şerkirin.

Ev şer di dîrokê de wek şerê birakujiyê tê pênasekirin. Birayek ji derve hin hêz anîbû û li dijî birayê xwe şer kiribe jî vê yekê naguhêrîne. Lê heger artêşa Artakserkses bi Grekan re şer bikira û Kyros jî biçûya li kêleka Greka şer bikira ev jî dibû ‘şerê xiyanetê’.

Wek vê mînakê, tiştên îro li Başûr diqewimin jî şerê birakûjiyê nîne. PKK û PDK şer nakin. Heger şer bikirina birakujî bû, lê heger dewleta Tirk û PKK şer bikin û PDK jî piştgirî bide dewleta Tirk û bixwaze birayê xwe tune bike, ev nabe şerê birakujiyê civak vê yekê bi awayek cuda pênase dike.

Di van çend rojan de gelek kes dema daxuyanî didin an jî bang dikin, dibêjin ‘em ‘birakûjiyê’ naxwazin.’ Na ev ne şerê du birayan û ne şerê birakujî ye. Hin kes jî bang dikin û dibejin; “Dive her du alî bi baldarî tevbigerin û berjewendiyên neteweya xwe esas bigirin.”

Banga me ji van kesan re heye. Ka bibêjin hûn ji PKK'ê helwestek çawa dixwazin. Hêzên malbata Barzaniyan li kêleka eskerên Tirk û êrişî gerîla dikin. PKK divê di demek wiha de çi bike? PKK'ê di vî warî de daxuyanî da û helwesta xwe eşkere kir û got; “Midaxle bikin bila kurd xwina kurdan nerêjînin. Pêşî li PDK'ê bigirin, bila di şerê me û dewleta Tirk de, li kêleka dijmin cîh negire.”

Civak manîpule kiribûn. Digotin, PKK bû sedem ku dijmin li vê derê ye. Dîsa digotin, armanca Dewleta Tirk, PKK'ê hincet nîşan bide ku Başûrê Kurdistanê dagir bike. Na, armanca dewleta Tirk de ev yek îroj nîne.

Dewleta Tirk a dagirker ji bo Başurê Kurdistan planek wî ya demdirêj heye. Ev plana xwe di salên 90'î de xistiye meriyetê. Gav bi gav dixwaze vê plana xwe bi encam bike.

Gerîla îroj ji bo dewleta Tirkiyê tehdît nînin. Du caran li ser daxwaza Rêber Abdullah Ocalan gerîla vekişiya ye herêma Başûr. Piştî vekişiya û hetanî roja me tu êrîşek çalakiyek pêk neanîn. Di şerê parastinê de bûn.

Lê dewleta dagirker, ji bo plana xwe pêk bîne êrişî gerîla dike. Sibê îhtimale li derdora Hewlêr, Silêmaniyê, Ranya, Herêma Barzan eskerê xwe bicîh bike û çawa Efrîn û Serêkaniyê dagirkiriye van herêman jî dagir bike. Hebûna PKK'ê hincet nişan bide. Bibêje ez li vêderê pêşî li lojîstîka PKK'ê digirim. Heger tiştek wiha biqewime ew roj PDK wê ji Hewlerê baz bide, berê xwe bide wan qesr û vîllayên li derveyî welat kirine. Ew hêzên îroj li dijî Gerîlla şer dikin jî wî di qereqol û bargehên wan de nobedariyê bikin.

Hin kurd jî ji vê yeke ditirsin û PDK'ê hişyar dikin û carnan jî lawa dikin. Em jî wek van kesan di weşanên xwe de, di rojnamegeriya xwe de bal dikişinin ser van metirsiya. Ev yek jî ihtîmal nîne. Em dewleta Tirk a dagirker baş nas dikin.